



Rêbernameya eVisa'yê





Greater Manchester
IMMIGRATION AID UNIT

Wergirtina rewşa koçberiya serhêl (eVisa): Çima ev yek giring e?

- ◀ Pergala sînorvanî û koçberiyê ya Brîtanyayê vediguhere rewşa **dijîtal**.

Wateya vê ew e ku pîrraniya belgenameyên fîzîkî yê koçberiyê:



- 
- ◀ eVisa **qeydeke serhêl** a rewşa koçberiya te ye.
 - ◀ Pîrraniya destûrên mayînê yên bayometrîk (BRP) xwedan tarîxa ekspayîrbûnê ya 31ê Kanûna 2024an in, ji ber **eVisa dewsa BRP'an digirin**. Ev nayê vê wateyê ku heyama mayînê di vê rojê de bi dawî tê. Eger tu piştrast nînî ku mayîna te kengî bi dawî dibe, dikarî biryarnameya ku te ji Wezareta Karûbarên Hundir (UKVI) wergirtiye, seh bikî.
 - ◀ Ji bo destragihîştina bo eVisa'ya xwe divê hesabekî Visa û Koçberiyê ya Brîtanyayê (UKVI) çê bikî da ku bikarî:
 - Rewşa xwe ya serhêl bibînî û biselimînî
 - Seh bikî bê ka mafên te li Brîtanyayê hene
 - Zanyariyên xwe yên kesane bi roj bikî – weke hûngiliyên xwe yên têkilîdanînê
 - ◀ Tu divê **ji bo her kesekî** ku destûra mayîna li Brîtanyayê heye hesabekî çê bikî – ev **zarok û xizmên te digire ber xwe**.
 - ◀ Pêvajoya daxwazê ji bo eVisa'yê **belaş e**.
 - ◀ **Şêwirîn ji bo rêwîyan** - hêleke alîkariya rêwîtiyê ya eVisa'yê ji saet 9ê b.n li gorî dema GMT'ê di roja 31ê Kanûna 2024an de bi hejmara 0800 876 6921 dê li ber dest be. Têkilî bi **belaşî ne**


Zanyariyên gelemperî



Te yê hewceyî bi çî hebe?

Ji bo destpêkirinê te hewce ye:

- ✓ Jîrefonek (iPhone 7 yan modela nûtir an jî telefona Android ku dikarî pê peredanên bêyî têkiliyê pêk bînî. Heke te ew tunebe, dikarî ji kesekî bixwazî ku alîkariya te bike)
- ✓ Belgenameya pênaseya te: Ev dikare BRP yan pasporta te be
- ✓ BRP an jî hejmara bernameya te (ev dibe ku wek UAN were binavkirin an jî bi tîpên GWF dest pê bibe)
- ✓ Roja Jidayîkbûna te
- ✓ Adresa Emaila te
- ✓ Hejmareke telefona destan
- ✓ Sepana “Koçberiya Brîtanyayê: Sehkirina ID’yê” ‘UK Immigration: ID Check’ bi dest bînî ku dikarî wê li Google Play yan App Storeê bibînî.




Heke te kart an jî pasporta BRP tuneze:

Heke ji te re destûra mayînê piştî 31ê Cotmeha 2024an hatiye dayîn, tu yê karta BRPê wernegirî. Wezareta Karûbarên Navxweyî li ser şêwaza bidestxistina eVisa'yê dê bi te re peywendî pêk bîne.

Heke beriya 31ê Cotmehê ji te re betlaneya ji bo mayînê hat dayîn lê karta te ya BRPê winda bûbe yan hatibe dizîn û pasporta te tunebe, hema wisa dikarî hesabê xwe çê bikî, lê dibe ku pêwîst be beşdarî hevpeyîvîneke vîdyoyî bibî li Ofîsa Wezareta Karênbarên Navxweyî bi mebesta piştrastkirina pênaseya te.

Heke betlaniya te ya ji bo mayînê ya bêsinor heye, lê te ti wextî BRP tunebûye, dikarî bernameyeke belaş a bêyî sînardariya demê (NTL) ji bo bidestxistina hesabê UKVI û eVisa'yê îcad bikî.




Xêzên Demê

Dema ku eVisa'ya te ji bo dîtinê li hesabê te yê UKVI'yê hat amadekirin, Wezareta Karûbarên Navxweyî dê ji te re Email bişîne. Bi awayekî asayî ev pêvajoyê ji 2 heta 3 rोजan diajo, lê dibe ku heta 8 hefteyan jî dirêj bibe.



Selimandina mafên xwe bi kodên parvekirinê Koda

Parvekirinê kodek e ku bi awayê serhêl tê berhemanîn û dikare ji bo selimandina mafên te bo kardêran an jî xwediyê malan were raberkirin. Ji bo selimandina mafê xwe yê karkriinê, dikarî ji bo kodeke parvekirinê li adresa xwarê daxwaza xwe raber bikî: <https://www.gov.uk/prove-right-to-work>. Ji bo selimandina mafê xwe yê Kriinê, dikarî ji bo kodeke parvekirinê li adresa xwarê daxwaza xwe raber bikî: <https://www.gov.uk/prove-right-to-rent/get-a-share-code-online>.



Bikaranîna kartên BRPê yê ekspayîrbûyî piştî 31^e Kanûna 2024

an Wezareta Karûbarên Navxweyî (Home Office) ragihandiye ku ji bo heyameke demkî, kesên ku xwedan betlaniya ji bo mayînê ya pêbawer in, hema wisa dikarin kartên xwe yê BRPê yê ekspayîrbûyî piştî 31^e Kanûna 2024an ji bo hinek armancan bi kar bînin. Eva rêwîti li nav û derveyî Brîtanyayê heta roja 31^e Adara 2025an li xwe digire. Bi vî halî em pêşniyaz dikin ku di dema herî zû de hessabekî UKVI û eVisa'yê çê bikî.

Rêbernameya gav-bi-gav a wergirtina rewşa koçberiya serhêl (eVisa)

Qonaxa 1: Hesabekî Visa û Koçberiya Brîtanyayê UK Visas and Immigration (UKVI) çê bike

Ji bo îcadkirina hesabê UKVI'yê hewceyîya te bi hesabê xwe heye.

- ✓ Hejmara BRP'yê; **yan**
- ✓ Hejmara daxwazê.

Heke te name yan Emailek wergirt ku ji te re dibêje ku hesabekî divê çê bikî, destûrkaran bişopîne yan jî biçe adresa <https://www.gov.uk/get-access-evisa>

Hûrgiliyên xwe binivîsîne û li ser “Create account” (“Çêkirina Hesab”) klîk bike.

Bi rêya Emailê piştrast dikî ku hesabê te yê UKVI'yê hatiye îcadkirin û dikarî têkevî.




Qonaxa 2 – Bi bikaranîna sepana sehkirina ID’ya Koçberiyê ya Brîtanyayê (UK Immigration ID Check), pênaseya xwe piştrast bike.

Sepana “Koçberiya Brîtanyayê: Sehkirina ID’yan” ‘**UK Immigration: ID Check**’li telefona xwe daxîne da ku pênaseya xwe piştrast bikî û eVisa’yê li hesabê xwe zêde bikî.


Sepan dê ji te bipirse ku:

- ✓ Ji bo kişandina wêneya BRP’yê yan pasporta xwe,
- ✓ Ji bo sehkirina zanyariyên belgenameya xwe û
- ✓ ji bo kişandina wêneyê rûyê te.


Kişandina wêneyan dikare dijwar be. Ji bo kişandina wêneya pasportê dikarî rêbernameya xwarê bi kar bînî. Ev rûpel her wiha tê de hin têbînî ji bo skenkirina belgenameyên te hebin: <https://www.gov.uk/guidance/using-the-uk-immigration-id-check-app>




✓
Plain
light-coloured
background




✗
Textured
background




✗
Object in
background




Even lighting
and no shadow




Shadow on
face




Shadow behind
head




Religious
headwear




Fashion hair
accessories




Fashion
headwear



Eyes fully
visible



Glasses
covering eyes



Hair covering
eyes

Qonaxa 3: Hesabê xwe li eVisa'yê girêbide

Piştî tevavkirina hemî erkan, piştrast bike ku te deklarasyon xwendiyê û li ser “Şandin” (“Submit”) klîk bike.

Dema ku eVisa'ya te ji bo dîtîna amade bû, tu yê Emailekê wergirî. Eva dibe ku çend rojan dem bibe.

eVisa'ya te li belgenameya pênaseyê ku te ji bo îcadkirina hesabê xwe bi kar aniye, tê girêdan. Heke dixwazî rêwîtiya derveyî Brîtanyayê bikî, divê beriya rêwîtiyê seh bikî bê ka belgenameya rêwîtiya niha ya te li eVisa'yê girêdayî ye.

Wergirtina alîkariyê li ser eVisa'ya te.

- ◀ Hin sazî hene ku dikarin alîkariya te ji bo damezirandina eVisa'yê bikin. Ji kerema xwe pêristek ji saziya li Brîtanyayê li vir bibîne: <https://www.gov.uk/government/publications/evisa-community-support-for-vulnerable-people/list-of-organisations#england>
- ◀ Tu dikarî bi rêya telefona (0300 790 6268) yan jî bi rêya adresa <https://ukimmigration-support-webchat.homeoffice.gov.uk/evisa> bi UKVI'yê re têkilî dayînî.

- ◀ GMIAU civînên piştevaniya qanûnî ji Çileyê 2025an ve li dar dixê da ku alîkariya gel bike ku eVisa'yên xwe îcad bikin – ji bo zanyariyên zêdetir bi adresa nicola@gmiau.org re têkilî dayîne.
- ◀ Tu dikarî zanyariyên mafzanî yê birojkirî yê me li ser pêvajoya eVisa'yê li vir bibînî: <https://gmiau.org/evisas/>

Sipas ji te ku te dema xwe ji bo wergerandina vê belavokê terxan kir

